*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (515)*04-04-2026*



N. Kawe Ahengerî

## Çima Komara Îslamî hîn jî maye (Serhildana giştî an dagirkirina leşkerî)?

Rejîma ku Îranê birêve dibe, ji zikê krîzeke pirqatî ya ku ji aliyê Pehlewîyan ve hatiye afirandin, hat ser desthilatê û desthilatdariya xwe bi darvekirin û kuştinan dest pê kir û heta roja îro bi tepeserkirin û fetisandinê ya mutleq berdewam e. Di nîv sedsala borî de, rejîma Xumeynî gelek caran rastî berxwedaneke bêhempa hatiye.Ji berxwedana çekdarî ya Kurdistanê bigire heta tevgera xwendekaran a 1378an a Rojî, Tevgera Kesk a 1388an a Rojî, serhildanên Befranbar .....

Dom» R:4



N. Dr. Mecîd Heqî

## Çima û çawa em yekîtiya xwe wekî gilêlka çavê xwe biparêzin?

Di roja duyem a meha "Rêbendan"ê de, dema ku berfên Zagrosê li ser lûtkeya çiyayan rûniştibûn, dengê daxuyaniyeke dîrokî, bêdengiya sar a siyaseta li Rojhilatê Kurdistanê şikand. Pêkanîna "Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê", ji bilî rêkeftineke partiyetî, bersivek bû ji bo pirsek sedsalî: "Gelo em ê di dawiyê de fêr bibin ku çawa bi hev re bijîn?"Ev gotar ne raporeke nûçeyan e, belku vekolîneke stratejîk e ......

Dom» R:5



N. Mojgan Elipûr

## Partiyên Siyasî yên Kurdistanê, Ezmûnek Berbiçav di têkoşîna ji bo Avakirina Demokrasiyê de

Di çarçoveya şiroveyên siyasî de, avakirina sîstemên demokratîk di civakên di bin rejîmên dîktatorî de pêvajoyek tevlihev, piralî û demdirêj e ku ne tenê bi guhertinek bilez ya desthilatdariyê re hevaheng e, lê di heman demê de avakirina bingehên kûr ên civakî û çandî jî hewce dike.Ji vê perspektîfê ve, ezmûna partiyên siyasî yên Kurdistanê weke yek ji xalên herî xurt û .....

Dom» R:9




# Di nava mehekê de 88 caran bi mûşek û dronan êrîşî ser Hizba Demokrat hat kirin

## Daxuyaniya Hizba Dêmokrat li derheq Sêdaredana 2 Girtiyên Siyasî

Roja duşemê, 10'ê Xakelêweya 1405'an a Koçî (31'ê Adara 2026), Komîteya Peywendiyên Îranî û Kurdistaniyan a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li derveyî welat, daxuyaniyek derbarê sêdaredana 2 girtiyên siyasî yên bi navên "Mihemed Teqewî" û "Ekber Danişwerkar" ku endamên Rêxistina Mucahidîn Xelq in, belav kir. Hizba Dêmokrat tevî sersaxî ji bo malbatên qurbaniyan û Rêxistina Mucahidîn Xelqê Îranê, ev kiryar wekî belgeyeke din a dirindetiya rejîmê û binpêkirina eşkere ya mafên mirovan û peymanên navneteweyî bi nav kir.

Di daxuyaniyê de hatiye diyarkirin ku rejîma Îranê di demekê de ku herêm ber bi şer û wêrankariyê ve biriye, di hundir de jî bi qutkirina înternetê û sînordarkirina peywendiyan, hewl dide di bin siya van aloziyan de dengê nerazîbûnan bifetisîne û bêrehmane neyarên siyasî ji nav bibe.

Hizba Dêmokrat daxwaz ji Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê û rêxistinên mafên mirovî kiriye ku tenê bi şermezarkirinê nemînin, lê belê gavên pratîkî û guşarên cidî bixin ser Komara Îslamî ji bo rawestandina pêla sêdaredanan.

Hizba Dêmokrat di dawiyê de tekez kiriye ku bêdengiya civaka cîhanî li hember van tawanan, dibe sedema tundtirbûna serkutkirinan, Lewma piştgirîkirina tevgera azadîxwaziya xelkê Îranê û parastina jiyana girtiyên siyasî wekî pêdiviyeke micid dibîne.



**Komara Îslamiya Îranê di heyama meha yekem a şerê Amerîka û Îsraîlê ligel rêjîma Îranê, 88 caran êrîşî ser Hizba Demokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ) kiriye.**

Di van êrîşan de pirtûkxane, nexweşxane, bingehên dermanî û malên di kempên medenî yên hizbê de û cihên niştecihbûna malbatên hizbê li nêzîkî Koye û Hewlêrê (Azadî, Amriye, Zewiyespî, Dêgelê, Jêjnîkan û Girdeçal) û baregehên pêşmergeyên hizbê li Balîsanê bi mûşek û dronan hatine armanckirin.

Hevdem ligel armanckirina Hizba Demokrat û çend hizbên din ên Rojhilatê Kurdistanê, hejmara wan mûşek û dronên ku di nava vê mehê de ber bi deverên cuda yên Herêma Kurdistanê ve hatine avêtin, ji 650 mûşek û dronan derbas bûye ku ji ber wan 14 kesan jiyana xwe ji dest dane û şehîd bûne û 93 kes jî birîndar bûne. 6 kes ji şehîdan pêşmergeyên Komelaya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê, Sazmana Xebata Kurdistana Îranê û Partiya Azadiya Kurdistanê ne.

Hizba Demokrata Kurdistana Îranê beriya niha jî ragihandibû ku êrîşên mûşekî û dronî yên Spaha Terorîst a Pasdarên Komara Îslamî bo ser bingehên hizbên Rojhilatê Kurdistanê û navendên serbazî û medenî yên Herêma Kurdistanê, ku ji rojên pêşîn ên destpêkirina şer ve berdewam in, beriya her tiştî nîşaneya dijminatiya hikûmeta tawanbar a Komara Îslamiya Îranê ye ligel neteweya Kurd li hemû beşên Kurdistanê.



## Peyama Hizba Dêmokrat bi helkefta 79 saliya sêdarêdana Pêşewa Qazî Mihemed

Dom » R:2



## Êrîşên dujminkaraneyên rêjîma Îranê bo ser bargehên Pêşmerge, binpêkirina serweriya siyasî ya Herêma Kurdistanê ye.

Dom » R:2

# Peyama Hizba Dêmokrat bi helkefta 79 saliya sêdarêdana Pêşewa Qazî Mihemed

**Xelkê mafxwaz ê Kurdistanê!**
**Malbatên serbilind ên şehîdan!**

79 sal bi ser sêdaredana Pêşewa Qazî Mihemed, yekem Serokkomarê Kurdistanê re derbas dibin. 10’ê Xakelêweya sala 1326’an a rojî, ew roj bû ku damezrînerê yekem desthilata modêrn û dêmokratîk a neteweya Kurd, bi biryara dadgeheke fermayîşî û zalimane ya desthilata gemar û dîktatoriya Pehlewî, canê wî yê pak hat standin.

Piştî 8 dehkan ji wê bûyera tal, niha ku em li paşeroja neteweya Kurd bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê dinêrin, ji bo me diyar dibe ku desthilatên naxelkî, sitemkar û dagirker mehkûmî ji navçûn û nemanê ne.

Ew dersa mafxwaziyê ya ku ji Komara Kurdistanê û damezrînerê wê ve ji bo me maye, her dem di bîra me de ye û her dem çira ronîker a rêya têkoşîna me bûye.

Ji ber wê jî, ew dîrok ji bo me ne wekî şîn û bêhêvîtiyê bûye, belkî bûye hander û palderek ji bo domandina wê rê û rêbazê.

Pêşewa Qazî Mihemed, ew kesayetiya helkeftî yê neteweya Kurd ku bi gotina şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlû “Gulek bû û li sehrayê şîn bibû”, tevahiya jiyana xwe ya kurt lê pir berhem a siyasî, terxanî komkirina hêz, yekrêzî û serweriya neteweya xwe kir.

Di wesiyeta xwe de jî ji bo nifşên pêşerojê – ku em û piştî me ne – çareseriya tebayî û yekrêziyê ji bo me bi cih hêlaye. Niha piştî çend dehsaliyan ji şehîdbûna serkirdeyê şehîd yê neteweya Kurd, em wek kurên Pêşewa Qazî Mihemed li Rojhilatê Kurdistanê, me hemû hewla xwe daye ku wê yekrêziyê pêk bînin û dersên Pêşewa ji bîr nekin.

Di rewşa hestiyar û dîrokî ya niha de, yekrêzî û hev-xebatiya hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, yek ji mezintirîn destkeftên siyasî û dîrokî ye û cihê dilxweşiya bi milyonan Kurd e li her çar parçeyên Kurdistanê.

Di heman demê de jî, kelemê nav çavê desthilatên dîktator û paşmayên desthilatên dîktator e û bûye astengeke mezin li pêşiya milhiriya wan.

Li ser me ferz e ne tenê vê hevpeymanî û yekrêziyê biparêzin, belkî divê em hemû hewla xwe bidin ji bo berfirehtirkirin û bihêztirkirina hevpeymaniya xwe û mizgîniya pêşwext a serkeftinê bidin neteweya xwe.

Pêşewa Qazî Mihemed em fêr kirn ku em yekrêz û yekgirtî bin, di heman demê de fêrî me kir ku di pêxema bidestxistina mafên xwe de ji tu egeran netirsin û xwe bo amade bikin. Ji ber wê, di welatê me de bi



hezaran pêşmergeyên canfeda, bi hezaran çalakvanên medenî, bi hezaran xelkê xwîngerm û serhildêr, canê xwe ji bo bidestxistina armancên me yên netewî feda kirine.

Beriya çend mehan bû ku xortên nîştiman li parêzgehên Îlam û Kirmaşan û digel tev bajarên Îranê jî, ji bo rûbirûbûna desthilata dîktator a Komara Îslamî, serî hildan û şeqam bi hawara rizgariyê tije kirin, lê mixabin bi hovtirîn şêwe hatin tepeserkirin.

Ev yek wê rastiyê ji bo me îsbat dike ku neteweya me ji dayîna nirxê natirse. Heke serkut û sêdarê bersiv bida, me kurdan piştî şehîdbûna Pêşewayê xwe, êdî rêya azadî û rizgariyê nedigirt ber xwe.

Em îro di demekê de û di 10’ê Xakelêweyê de yada rêberên xwe yên şehîd bilind radigirin ku neteweya me li Rojhilatê Kurdistanê ji her demê zêdetir nêzîkî serkeftin û rizgariyê bûye.

Em bi hemû şehîdên rêya rizgari û serfiraziya neteweya Kurd re peymana xwe nû dikin û sozê didin wan ku em ê li ser xwestek û armancên wan mukum bin.

Em daxwazê ji hemû xelkê Kurdistanê dikin ku yada vê roja mezin bi rûmet birêve bibin û Kurdistan, dîroka wê û daxwaz û mafên wê bi zindî bihêlin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Civakî**
**9’ê Xakelêweya 1405’an a Rojî**

# Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê daxuyaniyek belav kir




**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê: Êrîşên dujminkaraneyên rêjîma Îranê bo ser bargehên Pêşmerge, binpêkirina serweriya siyasî ya Herêma Kurdistanê ye.**

Li sibêdeha roja Sêşemî 24ê Adarê, rêjîma Îranê li 2 êrîşên cuda yên mûşekên balistîkî de li devera Soran de êrîş kire ser bargeheke firqya 7 a piyade ya devera 1 û hêzeke firqeya 5 a piyade ya Hêza Pêşmergê Herêma Kurdistanê; li vê kiryara dujminkaraneya rêjîmê de 6 Pêşmerge şehîd bûn û zêdetir ji 30 Pêşmerge û herwisa hejmarek ji xelkê medenî yên deverê birîndar bûn.

Êrîşên mûşekî û dironiyên spaha pasdaran a terorîst bo ser binkeyên Hizbên Rojhilatê Kurdistanê û navendên serbazî û medeniyên Herêma Kurdistanê ku ji rojên yekem ên qewimîna şer ve berdewam bûne, berî her tiştekê nîşanderê dujminatiya vê hikûmeta cinayetkar digel netewa Kurd li hemû beşên Kurdistanê ye.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê tevî ragihandina hevxemiya xwe digel malbatên şehîdan û xelkê Herêma Kurdistanê, Wezareta Pêşmerge û Hikûmeta Herêma Kurdistanê, careke din jî êrîşên komara îslamî û hêzên milîsên navxweyê Îraqê bo ser Herêma Kurdistanê bi tundî şermezar dike û daxwaz ji welatên hevpeyman û civaka cîhanî dike ku li hember destdirêjî û dujminkariyên komara îslamî bisekinin û helwîst û berteka lezgîn li hember binpêkirina serweriya siyasî ya Herêma Kurdistanê û tawankariyên şer ên komara îslamiya Îranê hebin.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**24ê Adara 2026**

# Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê Bi helkefta 10ê Xakelêweyê, Roja Şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed

**Civatên xelkê têkoşer ê Kurdistanê!**
**Xebatkarên rêka azadî û rizgariyê!**

10ê Xakelêweya îsal, 79 sal bi ser sêdaredana Pêşewa Qazî Mihemed, Serkomarê Kurdistanê re derbas bûn. 79 sal berî niha, di sipêdeha roja 10ê Xakelêweya sala 1326an a rojî de, Pêşewa Qazî Mihemed, Seyfî Qazî û Sedrî Qazî ji aliyê hikûmeta Mihemed Riza Şahê Pehlewî ve di Meydana Çarçira ya bajarê Mihabadê de hatin sêdaredan. Di rojên berî û piştî 10ê Xakelêweya 1326an de jî, hejmareke zêde ji rêber û karbidestên Komara Kurdistanê hatibûn îdamkirin. Bi vî awayî, şehîdên Komarê bûn serqafilê karwanekê ku heta îro jî di pêxema bidestxistina armancên neteweya kurd de berdewam e.

Pêşewa Qazî Mihemed kesayetekî olî, ronakbîr û neteweyî yê kurd bû ji malbateke rêzdar a devera Mukriyanê. Zanayî û jêhatiya Qazî Mihemed bû sedem ku piştî endambûna di "Komelay J.K" de, zû bibe serokê vê rêxistina siyasî û paşê bi damezirandina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê (HDK), rê ji bo ragihandina Komara Kurdistanê xweş bike. Bêguman damezirandina Komara Kurdistanê di wê serdemê de biryareke wêrekane û ramaneke bihêz a neteweyî û nîştimanî dixwest; Pêşewa û hevalên xwe xwediyê vê vînê bûn û bi fîdakariyê xewna neteweyeke bindest û mafxwarî pêk anîn.

Pêşewa Qazî Mihemed di serdemekê de ku dîktatoriya Pehlewî siya xwe ya reş bi ser Îranê de kêşabû û hemû netewe ji mafên neteweyî, siyasî û medenî bêpar kiribûn, xebata siyasî ya ji bo rizgariya kurd di forma modêrn a partiyayetiyê de bi rê xist. Bi damezirandina Komara Kurdistanê, mînakeke serdemiyane û pêşketî ya hikimraniya kurdî nîşan da. Birêvebirina Komara Kurdistanê bi lîyaqeteke mezin, beşdariya têkoşerên kurd ji bo piştgiriya Komarê, afirandina tebahiyeke mezin di nav civaka kurdewarî de, bidestxistina destkeftên dîrokî di warên pêşmêrgayetî, ewlehî, çandî, civakî û perwerdeyê de û damezirandina rêxistinên sînfî ku heta wê demê di dîroka kurd û herêmê de mînaka wan nehatibû dîtin, hemû nîşana jêhatîbûn û mezinahiya kesayetiya Pêşewayê me ne.

Dadgehîkirina Qazî Mihemed di dadgehên neheq ên rêjîma paşayetiya Pehlewî de, rehendeke din a kesayetiya Pêşewa îsbat kir. Pêşewa ku bi biryareke wêrekane û bi bikaranîna derfeteke dîrokî karîbû Komara Kurdistanê damezirîne, bi heman awayî bi wêrekî di zîndan û dadgehên hikûmeta Pehlewî de berevanî di mafên rewa yên neteweya xwe kir û bi serbilindî canê xwe fîdayê kurd û nîştiman kir. 79 sal piştî şehîdbûna Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, berdewamiya rêvîngên mekteba Pêşewa di xebata ji bo rizgariya Rojhilatê Kurdistanê de, ramana Pêşewa di nav xelkê Kurdistanê de bi zindî hiştiye. Lewma bi salan e Pêşewa Qazî Mihemed bûye sembola herî mezin a xebata rizgariya neteweyî û armancên wî bûne xala hevpar a hemû hêz, rêxistin û qatê cuda yên civakê.




Salvegera şehîdkirina Pêşewa di demekê de ye ku rejîma Komara Îslamî bi berdewamkirina heman siyaseta serkutker a rejîma Pehlewî, ne tenê neteweya kurd ji mafên herî destpêkî bêpar kiriye, belku bi siyasetên xwe yên şerxwazane, qedera Îran û hemû pêkhateyan ber bi herifînê ve biriye. Bêguman heta ku ev rejîm hebe, ne neteweyên Îranê digihîjin mafên xwe û ne jî aramî û ewlehî li Îran û herêmê pêk tê.

Di 79emîn salvegera şehîdkirina Pêşewa Qazî Mihemed de, Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê tekeziyê li ser rêbaza Pêşewa û hemû serkirde û têkoşerên şoreşa nû ya Rojhilatê Kurdistanê dike. Em radigihînin ku xebata me ji bo bidestxistina mafê diyarkirina çarenûsa neteweya me berdewam dibe. Em pişrast in ku Komara Îslamî nikare bi afirandina qeyranên navxweyî û derveyî û çêkirina şer û aloziyên ligel Amerîka û Îsraîlê, dengê azadîxwaziya xelkê Kurdistanê bifetisîne. Lewma xebata me heta sernixûniya vê rejîmê berdewam dibe.

Em her weha tekez dikin ku yekrêziya hêzên siyasî, tenê bersiva bihêz e ji bo pûçkirina planên rejîmê û parastina Kurdistanê ji her alozî û qeyranekê.

Silav li canê paqij ê Pêşewa Qazî Mihemed û hemû şehîdên Kurdistanê!

Bilind be ala Kurdistanê û serkeve xebata rewa ya gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê!

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê**

**9ê Xakelêweya 1405a Rojî**

# Êrişkirina ser mala Serokê Herêma Kurdistanê, geşepêdana bêîstîkrariya ewlehiyê ye li Herêma Kurdistanê




**Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê:**
**Êrişkirina ser mala Serokê Herêma Kurdistanê, geşepêdana bêîstîkrariya ewlehiyê ye li Herêma Kurdistanê**


Pêşnîvroya îro Şemî, 8ê Xakelêweyê (28ê Adarê), bi şeş dronan êriş hat kirin ser Dihok û Hewlêrê ku yek ji wan cihan mala birêz Nêçîrvan Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê bû. Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê, êrişkirina ser mala Serokê Herêma Kurdistanê li Dihokê bi tundî mehkûm dike û li ser wê baweriyê ye ku ev êriş gefeke ewlehiyê ya mezin e bo ser Herêma Kurdistanê û beşek e ji plana têkdanê ya rejîma Komara Îslamiya Îranê û dijminên din ên kurd li Iraqê, ji bo têkdana aramî û îstîkrara Herêma Kurdistanê.

Rejîma Îranê di meha borî de bi berdewamî Herêma Kurdistanê kiriye qada yekalîkirina nakokî û şerên xwe yên li gel Amerîka û Îsraîlê, ji ber van sînorbezkirin û destdirêjiyan, ziyanên canî û madî yên zêde gihîştine xelk û hêzên Pêşmerge li Herêma Kurdistanê. Ji ber wê yekê, pêwîst e hikûmeta federal û civaka navdewletî bi lez sînorekê ji bo van destdirêjiyên Tehranê daynin û rê nedin ku Komara Îslamî bêtirî vê gefan li ser îstîkrara Herêma Kurdistanê çêbike.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê, tevî mehkûmkirina van êrişan, hevdem piştevaniya xwe ya temam ji bo parastina serweriya siyasî a Herêma Kurdistanê dubare dike.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasiyên Kurdistana Îranê**

# Çima Komara Îslamî hîn jî maye (Serhildana giştî an dagirkirina leşkerî)?



N. Kawe Ahengerî
W. Hesen Mukerem

Rejîma ku Îranê birêve dibe, ji zikê krîzeke pirqatî ya ku ji aliyê Pehlewîyan ve hatiye afirandin, hat ser desthilatê û desthilatdariya xwe bi darvekirin û kuştinan dest pê kir û heta roja îro bi tepeserkirin û fetisandinê ya mutleq berdewam e. Di nîv sedsala borî de, rejîma Xumeynî gelek caran rastî berxwedaneke bêhempa hatiye.

Ji berxwedana çekdarî ya Kurdistanê bigire heta tevgera xwendekaran a 1378an a Rojî, Tevgera Kesk a 1388an a Rojî, serhildanên Befranbar û Xezelwera salên 1396 û 1398an a Rojî, û di dawiyê de serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya seranserî, û her wiha Şerê 12 Rojan di navbera Îsraîl û Îranê de û şerê dawî û berdewam ku tê de Amerîka û Îsraîl bi rejîma Xumeynî ya rizî re rûbirûne. Şereke ku heta niha bi sedan xalên ewlehî û leşkerî yên rejîma Xumeynî rastî êrîşan hatine û bi dehan hêmanên ewlehî û siyasî yên sereke yên sîstema Xumeynî hatine ji holê rakirin.

Tevî van hemûyan, pirsek sereke hîn jî bêbersiv dimîne: çima rejîma Xumeynî, tevî krîza rewatiyê li ser asta Îranî û navneteweyî û gelek krîzên ku gel, welat û pergala serdest girtiye, ji hemû derbên ku xwariye hîn sax maye? Ev gotara kurt dê du faktorên sereke yên di domandina rejîmê de heta astekê zelal bike.

Bi salan e, me li ser krîz û bêbandoriyên ku rejîma Îranê pê re rû bi rû maye bihîstiye. Me li ser krîzên aborî, enerjiyê, rewatiyê (hem navxweyî û hem jî navneteweyî), ewlehî, civakî, psîkolojîk, navneteweyî, herêmî û ... bihîstiye, û dihat texmînkirin ku her rejîmek din a bi asteke wisa ya krîzê dê pir zutir hilweşiyaba, lê weke ku em dibînin, ew hîn jî li ser piyan e.

Ez li ser vê baweriyê me ku gelek sedem dikarin rave bikin ka çima rejîma Xumeynî heta roja îro maye, lê du sedemên sereke di nav hemû sedeman de derdikevin pêş; yek hebûna Spaha Pasdaran ya terorîst e û ya din jî nebûna alternatîfekê ye. Lêbelê, sernavê van her du faktoran divê bi tenê behsa karesatê neyê sînordarkirin, ji ber vê yekê ez ê van her du faktoran bi qasî ku ji destê min tê bi kurtasî şirove bikim.

**Çima saziya terorîst a Spaha Pasdaran di mayîndebûn û domandina rejîma Xumeynî de faktorek bûye?**

Pir kes li ser vê baweriyê ne ku saziya terorîst a Spaha Pasdaran, ji ber nepopulerbûna wê û hebûna hêza tepeserkirinê (psîkolojîk, îdeolojîk û leşkerî), bûye sedema berdewamiya rejîma komarî ya binav-îslamî li Îranê. Ez hêza tepeserkirina saziya terorîst a Spaha Pasdaran înkar nakim, lê di dîroka şoreşên gelêrî yên cîhanê de, em şahîdê rejîmên çekdartir û bihêztir bûne ku bi destpêkirina tevger û serhildanek neteweyî hatine hilweşandin, û di dawiyê de gel kariye tepeserkirina leşkerî ya rejîma serdest û otorîter têk bibe û ji bo welat û gelê wê azadiyê bi dest bixe.

**Lêbelê, ev rewş û encam hîn ji bo Îran û Îraniyan çênebûye, û pirs ev e çima?**

Bersiva vê pirsê di pêkhate û çarçoveya Spaha Pasdaran (IRGC) ya terorîst de ye. Berevajî ya ku gelek kes difikirin, Spaha Pasdaran sîstemek hiyerarşîk e û têkçûna wê bi nêrînek jor an hereketek jor ve mimkun e. Lêbelê, di pratîkê de, em dibînin ku ne tenê jiholêrakirina gelek rêberên terorîst ên IRGC, lê heta jiholêrakirina Xameneyî, rêberê Komara Îslamî, nebûye sedema hilweşîna rejîma wî.

Bi salan e ez behsa komek peyvan dikim, ew jî ev in ku Komara Îslamî komek ji giravên mafyayên xweser e, û di bingeh de Komara Îslamî bi awayeke klasîk nayê çareserkirin. Bi jiholêrakirina Rêberê Komara Îslamî, jiholêrakirina bi dehan endamên payebilind ên Spaha Pasdaran(IRGC) û rejîma serdest a Îranê, xuya ye ku encama xwestî, ku hilweşîna Komara Îslamî ye, hîn nehatiye bidestxistin. Ev bi rastî jî me re dibêje ku em bi pergalek cûda re rû bi rû ne. Komara Îslamî ne rejîmek siyasî-leşkerî ya berê ye, lê belê komek ji giravên mafyayên xweser e, ku jiholêrakirina rêberên wê dê bihêle ku ev pergal hêza xwe ya serokatiyê û rêveberiyê ji nû ve hilberîne.

Bi gotineke din, ev rejîm ji aliyê komek berjewendî û bingehên taybet ve tê birêvebirin, ne ji aliyê yek kesî an hiyerarşiyeke jor ve. Ev rejîm ne qadeke mayînan a xwedî pirensîbe e, lê belê em bi qadeke mayînan a bê pirensîb re mijûl dibin. Ji ber vê sedemê, nêzîkatiya me ya li hember rejîma ku Îranê birêve dibe divê bi vê xala girîng di hişê xwe de were xebitandin. Ji ber vê sedemê, bombebarankirina binkên ewlehî û leşkerî yên rejîmê ne hewce ye ku bibe sedema hilweşîna rejîmê. Berevajî vê, têkoşîn û êrîşeke hevrêz, piralî û hevbeş dikare derbeya dawî li hebûna vê rejîmê bide.



Berî ku ez vê mijara girîng (têkoşîn û êrîşa piralî û hevbeş) bidomînim, ez pêwîst dibînim ku balê bikişînim ser faktora duyemîn û bibandor a di domandina rejîma serdest a Îranê de.

Tu serhildan an şoreş bêyî “seroktiyê” temam nabe. Ez tekezî li ser seroktiyê dikim, ne rêberiyê. Sedema herî girîng a domandina rejîmê heta niha, nebûna alternatîfek û nebûna seroktiyek siyasî ji bo birêvebirina dînamîzma civakî ya xwepêşandana Îranê, diyariyek e ku opozîsyonê daye Komara Îslamî.

Bi raya min û bi awayeke din, opozîsyon di “krîza seroktiyê” ya çaresernekirî de ye.

**Di nav vê serhildana seranserî de, dengê ji bo pêşxistina rêbertiyê bes e ku were dîtin û bihîstin, lê çima “pêşxistina rêbertiyê” ne çareseriya çareserkirina vê kêmasiya micid ya ji bo opozîsyonê ye?** Bersiv eşkere ye, helwest û pêkhateya opozîsyonê pir reng e û di dîtin û nêzîkatiyên siyasîhişmendî de cûdahiyên micid hene, û bi dîtina rastiya dîrokî û pir rengiya a Îranê, bi raya min, ev pir xwezayî ye. Ji ber vê yekê di rastiyê de, celeba têkiliyê bi vê rastiyê re jî divê xwedî cewher û rêbazek cûda be.


Bi gotineke din, ti partî an kesekê bawerî bi rêberiya hemû Îraniyan nekiriye û dê qet nebe jî, ji ber vê yekê divê em bi awayeke cuda li vê mijarê binêrin û ber bi çareserkirina vê puzzle ve biçin. Di dawiyê de, dema ku careke din hebûna gelek faktoran di domandina rejîma ku li Îranê desthilatdariyê dike de tekez dikim, ez bawer dikim ku nenasîn û ne jî mijûlbûna bi Spaha Pasdaran ya terorîst re, ku bi rastî ev rejîmê di çend dehsalên borî de bi rê ve biriye û domandiye, ne hikûmetê û artêşa wê, digel çareserkirina puzzlê ya alternatîf, dikare derbeya dawî li hebûna vê rejîmê bide.

**Bi ya min, ev mijara girîng niha jî girîng e, piştî derbên leşkerî yên giran ku rejîmê ji Amerîka û Îsraîlê dîtiye. Êrîşeke bejayî ji çend herêmên ku navenda wan Tehran, Kurdistan, Belûçistan û Xuzistanê ye, dikare şiyanên leşkerî û berevanîkirinê yên rejîmê têk bibe, û di heman demê de, piştgiriya serhildaneke giştî û gel dê were tacîzkirin.**

Ev mijar dê neyê bicîhanîn heya ku mijara çareseriyên alternatîf di asta partî û rêxistinan de bi rêxistinên meydanî ji bo rûbirûbûna meydanî û rêxistinî bi rejîmê re di zûtirîn dem de neyê çareserkirin û bicîhanîn. Min di sala 2012an de di konferansa Pragê de ku ji hêla “Yekîtiya Demokrasiyê li Îranê” (UDI) ve hatî organîzekirin, pêwîstiya rûbirûbûna rêxistinî bi rejîmê re anî ziman, û girîngiya vê mijarê îro ji her demê girîngtir e.

Bila em ji bîr nekin ku rejîm dê li Tehranê bikeve, ne li Kirmaşan, Zahidan, an Ehwazê. Ji ber vê yekê, her çend qadeke girîng û stratejîk a bi navê Tehran ji bo rejîmê surprayz bike û misoger bike jî, êrîşeke leşkerî û bejayî li ser rejîmê li çend herêmên welêt di bin rêbertiyeke hevbeş de dê îhtîmala serhildaneke giştî pir zêde bike, û bi vî rengî, em dikarin bi lez û bez û bi lêçûnek kêmtir rejîma Xumeynî hilweşînin û azadbûna Îran û Îraniyan bibînin.

# Çima û çawa em yekîtiya xwe wekî gilêlka çavê xwe biparêzin?



N. Dr. Mecîd Heqî

Di roja duyem a meha "Rêbendan"ê de, dema ku berfên Zagrosê li ser lûtkeya çiyayan rûniştibûn, dengê daxuyaniyeke dîrokî, bêdengiya sar a siyaseta li Rojhilatê Kurdistanê şikand. Pêkanîna "Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê", ji bilî rêkeftineke partiyetî, bersivek bû ji bo pirsek sedsalî: "Gelo em ê di dawiyê de fêr bibin ku çawa bi hev re bijîn?"

Ev gotar ne raporeke nûçeyan e, belku vekolîneke stratejîk e ji nêrîna çalakvanekî Kurd ku bi salan ji bo yekîtiya hêzên Kurdistanî têkoşiyaye; ji bo neteweyekê ku di nava bahozên jeopolîtîk ên Rojhilata Navîn de, "yekîtî" ji bo wî ne tenê bijardeyeke siyasî ye, belkî tenê zirxê mayî ye ji bo man û jiyanê. Divê em fêr bibin ka çima parastina vê hevpeymaniyê, bi qasî parastina "gilîlka çavê", jiyanî û nayê nîqaşkirin e.

**Tabûya duberekiyê: Çima yekîtî ji bo me zehmet e?**

Berî ku em qala "çawaniya yekbûnê" bikin, divê em bi rastgoyiyeke bêrehm ji xwe bipirsin: Çima em heta niha têk çûne? Werin em siyasetê ji pencereya "dîrok û derûnnasiyê" ve binirxînin:

Ji bo me Kurdan, duberekî ne "qeder"ek e, belkî berhema "trawmayeke giştî" ye. Sedsalek serkutkirina sîstematîk, înkarkirina nasnameyê û xiyanetên dubare yên navneteweyî, di binhişê me yê komî de "bêbaweriyeke kronîk" afirandiye. Dema ku gur hertim ji derve êrîş dikin, me hêdî hêdî bi guman li birayên xwe jî nêriye.

Ev "hişmendiya mayînê" bûye sedem ku em li şûna stratejiyên demdirêj, bi serkeftinên piçûk û demkî kêfxweş bibin. Lê rastî ev e: Di lîstika desthilatdariyê ya erdnîgariya me de, tu tevgerek bi tenê bi ser nakeve. An em hemû bi hev re digihîjin mafên xwe yên neteweyî, an jî em hemû bi hev re di nava tecrîdê de dimînin.

**Erdnîgariya perçekirî û pêwîstiya "Navendiya hizrî"**

Rojhilatê Kurdistanê, ji ber nebûna navendeke siyasî ya yekbûyî û dabeşbûna di navbera hêzên herêmî de, her tim ji "duberekiya elîtan" êş kişandiye. Her beşek ji tevgera me, di bin bandora şert û mercên xwe yên taybet de pêşketiye. Lê belê hevpeymaniya nû, gavek e ji bo avakirina "projeyeke neteweyî ya hevpar".

Divê em fêm bikin ku yekîtî, ne bi wateya yekkirina nêrîn û baweriyan e. Di demokrasyeke laîk û pirdeng (plural) de, ku armanca sereke ya vê hevpeymaniyê ye, cudahiya nêrînan dewlemendiyek e, ne metirsiyek. Lê divê ev cudahî li dora xalekê bizivirin: Mafê çarenivîsê.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistanê, niha heman "gilîlka çavê" ye ku divê hemû ronahiyên belavbûyî di xalekê de kom bike da ku em asoya serkeftinê bibînin.

**Armancên stratejîk: Wêdetirî dirûşmeyan, ber bi çalakiyê ve**

Hevpeymaniya şeşalî li ser sê prensîbên zêrîn tekez kiriye ku divê bibin "hizrên siyasî" yê her welatiyekî Kurd:

- Hilweşandina desthilatdariya dîktatoriyê: Ji ber ku azadiya Kurdistanê di kûlîsa azadî û demokrasiya li seranserê Îranê re derbas dibe.
- Mafê çarenivîsê: Ev ne xwestekek e, belkî mafê me yê xwezayî û mirovî ye ku di manîfestoya hevpeymaniyê de hatiye bicihkirin.
- Sîstema nenavendî û laîk (sekuler): Garantiya wê yekê ku di Îrana siberojê de, ti ol an îdeolojiyeke taybet nikaribe nasnameya me ya neteweyî serkut bike.

**Çawa em yekîtiyê "sazîbûyî" bikin?**

Hest û dirûşm, sotemeniya destpêkê ya her tevgerekê ne, lê motora ku serkeftinê dimeşîne, "sazîkirin (sazîbûn)" e. Ji bo ku ev hevpeymanî mîna mînakên berê negihîje xitimandinê, divê xwedî avahiyekê be ku ji rêkeftina serokan wêdetir be. Rêbazên jêrîn, damarên jiyanî yên vê yekîtiyê ne:

- A) Derbasbûna ji "perestina kesayetiyê" ber bi "aqilê komî": Bi salan e em baca nakokiyên şexsî yên serokan didin. Divê hevpeymanî li şûna kesperestiyê, li ser esasê "qaîdeyên lîstikê" bê birêvebirin.
- B) Avakirina navenda çareserkirina nakokiyan: Pêdiviya me bi "dadgeheke bilind a navxweyî" heye da ku berî alozî derbasî medyayê bibin, di atmosfereke biratî û pisporî de werin çareserkirin.
- C) Perwerdekirina çanda rêxistinî ya hevpar: Kadroyên partiyên cuda divê fêr bibin ku hevrikê wan ê sereke ne partiya bira ye, belkî ew sîstem e ku mafên wan înkar dike.
- D) Girêdana bi civaka sivîl re: Divê ev hevpeymanî di odeyên girtî de nemîne. Lidarxistina "Kongreyeke Neteweyî ji bo Rojhilatê Kurdistanê" bi beşdariya pispor, jin, ciwan û çalakvanên sivîl, dê "rewabûneke cemawerî" û "hêza berdewamiyê" bide vê yekîtiyê.




**Qeyrana baweriyê: Jehra ku divê bê pûçkirin**

Dijminên me, bêhtirî ku ji tifingên me bitirsin, ji "yekbûna hişên me" ditirsin. Stratejiya hertimî ya odeyên hizrî yên ewlehiyê, derzîkirina reşbînî û gotegotan di nav hêzên me de ye. Parastina yekîtiyê "wekî gilîlka çavê" tê wateya: Her gotegoteke ku em li dijî tevgereke Kurdî dibihîzin, berî ku em bawer bikin, divê em wê di parzûna "qazanc û ziyana neteweyî" re derbas bikin. Pêdiviya me bi "rênesansa baweriyê" heye. Şefafiyeta di biryardayinê de û bersivdayîna raya giştî, tenê riya ku dikare sermayeya civakî ya zirardîtî ji nû ve ava bike ye.

**Çima niha? (Kêliya diyarker a dîrokê)**

Rojhilata Navîn ji nû ve tê dîzayînkirin. Sîstema kevnar di qonaxa rûxanê de ye û di vê navberê de, tenê dengê wan neteweyan tê bihîstin ku bi "yek dengî" diaxivin. Ji bo me, duberekî tê wateya jêbirina ji erdnîgariya siberojê. Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, keleha dawî ya aqilmendiya me ya siyasî ye.

Divê em vê yekîtiyê biparêzin, ne ji ber wê yekê ku em mecbûr in ji hemû bernameyên hevdû hez bikin, belkî ji ber wê yekê ye ku "çarenivîseke me ya hevpar" heye. Serkeftina yekî, serkeftina hemûyan e û têkçûna yekî, kavilek e ku dê bi serê hemûyan de hilweşe.

**Ji "Trajediyê" ber bi "Destanê" ve**

Her bûyerek di qada demê de tê darizandin. Nifşên paşerojê dê derbarê me de biryar bidin: Gelo em ew nifş bûn ku di nava enaniyet û nakokiyên piçûk de man û derfeta mezin a azadiyê şewitandin? An em ew nifş bûn ku bi wergirtina dersan ji birînên trawmayê, "saziya yekîtiyê" ava kir?

Parastina Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistanê, erkek e ku ji milê serokan dest pê dike û dikeve ser milê her welatiyekî Kurd. Divê em vê hevpeymaniyê wekî "gilîlka çavê xwe" biparêzin; ji ber ku eger ev çav zirarê bibîne, dê hemû netewe di tariya dîktatorî û duberekiyê de winda bibe.

Werin em ji bo carekê jî be, aqilmendiyê bixin pêşiya hestan, û neteweyê bixin pêşiya partiyê. Ev yekane riya gihîştina lûtkeya azadiyê ye.

Xala stratejîk: Yekîtî, ne tesadufek e, ew "pêvajoyeke rojane" ye ku pêdiviya wê bi lênerîn, sebir û fedakariyê heye. Îro, roja mezinahiya siyasî li Kurdistanê ye.

# Ramanên Pêşewa Qazî Mihemed, Manîfesta Rizgariya Neteweyî


N. Serbest Urmiye




Di avakirina gotara nûjen a rizgariya neteweyî de, raman û kiryarên siyasî yên Pêşewa Qazî Mihemed xwedî cihekî bingehîn in di dîroka hemdemî a Kurdistana de.

Pêşewa bi girêdana daxwazên neteweyî yên Kurdan bi pirensîbên demokrasiyê, mafên sivîl û nasnameya çandî û neteweyî û siyasî re, modelek ji têkoşîna siyasî pêşkêş kir ku dikare wekî "Manîfesta Rizgariya Neteweyî" li Kurdistanê were naskirin.

manîfestek ku bi awayekî objektîv di ezmûna dîrokî ya Komara Kurdistanê de hate xuya kirin û heta îro jî di hizra siyasî û neteweyî ya Kurdan de xwedî pêgeheke bilind e.

**Rizgariya Neteweyî; Ji xwestekên destpêkî ve bo Gotara Siyasî ya Modern**

Di nîva yekem a sedsala 20'an de, Rojhilata Navîn meydana berfireh a guherînên siyasî yên kûr bû.

Hilweşiyna pêkhateya desthilatên kevneşop parêz, serhildana dewletên neteweyî û xurtbûna ramanên siyasî yên modern rê li ber tevgerên neteweyî bo gelek neteweyan vekir.

Di vê derftê de, Pêşewa Qazî Mihemed jî karî ku pirsgirêka gelê Kurd ji asta pirseke herêmî ve bo asta gotarek siyasî ya modern bilind bike.

Di ramanên Pêşeway'ê Kurdan de, rizgariya neteweyî ne tenê serxwebûna siyasî bû, belkû komelek mafên bingehîn ji xwe digirtin: mafê beşdarbûna di desthilatdariyê de, mafê parastina nasnameya rêkxistinên siyasî, neteweyî, çandî û zimanî.

Baweriya han jî bû sedem ku têkoşîna neteweyî ya gelê Kurd di şikil û pêkhateyên siyasî û rêkxistiên modern de pêş bikevin û ji form û rêkxistinên li serhildanên herêmî de derkevin û yekîtiya rêkxistin û gotara siyasî û neteweyî di Kurdistanê de jî derkeve.

**Komara Kurdistanê, Ezmûna Pratîkî ya Ramanekê**

Damezrandina Komara Kurdistanê di sala 1946'an de dikare wekî xaleke zêrîn di dîroka siyasî û neteweyî ya Kurdistanê de were hesibandin.

Ev ezmûn di guherîna binçîneyî ya pisra Kurd de ji daxwaza rizgariya neteweyî ve bo forma hikûmeta neteweyî ya modern, pengeha herî xurt bû.

Di bin siya Komarê de, pirensîbên wekî beşdariya siyasî ya gel, berfirehkirina perwerdehiya bi zimanê Kurdî, pêşxistina çapemeniyê û xurtkirina saziyên sivîl derketin rojevê.

Her çend jiyana vê ezmûnê ne pir dirêj bû, lê da selimandin ku di tevgera neteweyî ya gelê Kurd de hêza bûnê bi pirojeyeke siyasî di çarçoveya rêkxistina nûjen de heye.

Vê ezmûnê her wiha da xuyakirin ku heke rizgariya neteweyî di rengeke demokratîk de were rêkxitin û organîze bibe, dikare bibe modeleke pesend kirî di birêveberiya civakên pir netewe de jî.

**Çand û Ziman, Stûnên Azadiyê**

Yek ji taybetmendiyên berbiçav di hizir û ramanên Pêşewa Qazî Mihemed de, girîngî dan bi mijarên çandî û ziman bû. Pêşewa, zimanê Kurdî ne tenê wekî emrazê ragihandinê, belkû wekî hêmayeke bingehîn di nasnameya neteweyî pênase dikir.

Lewma siyasetên çandî yên dewletê di Komara Kurdistanê de, li ser bingehê xurtkirina ziman û çanda Kurdî bûn.

Weşandina pirtûk û rojnameyan bi zimanê Kurdî, perwerdehiya bi zimanê dayikê, û girîngî dan bi çalakiyên hunerî û çandî beşek ji wan pêngavan bûn ku ji bo vejandina nasnameya neteweyî hatin havêtin.

Di wir de ye ku derdikeve ku di ramana rêber de, azadiya neteweyî bêyî azadiya çandî û zimanî wateya serrast nade.

**Rêxistina siyasî, gaveke xurt ber bi biniyat danîna têkoşînê ve**

Aliyek din ê girîng di ramanên Pêşewa Qazî Mihemed de, tekez kirin bû li ser rêxistina siyasî û afirandina saziyên nûjen.

Di vî warî de jî, damezrandina rêkxistineke siyasî û neteweyî ya nûjen wekî Hizba Demokrat a Kurdistanê, xelateke mezin bû kû Pêşewa diyarî tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê kir.

Partiya han hewil da ku têkoşîna neteweyî ji asta tevgerên xwecihî ve bigihîne asta bernameyek siyasî ya hevgirtî.

Avabûna wê partiyê, bernameyeke siyasî bo beşdariya hêzên civakî pêşkeş kir ku tevgera rizgarîxweziya gelê Kurd ji qonaxa berxwedana kevneşopî derbasî qonaxa siyaseta serdemî bibe.

**Mîrata Rewşenbîrî ya Pêşewa di Siyaseta hemdemî ya Kurdistanê de**

Rast e ku Komara Kurdistanê hate hilweşandin, lê ramanên Pêşawa Qazî Mihemed wekî mîrateke mayînde di hizra dîrokî, neteweyî û siyasî ya Kurdistanê de mane. Ev raman li ser sê eslên bingehîn ava bûyne: azadiya neteweyî, demokrasî û dadperweriya civakî.

Niha di Kurdistanê de piraniya tevgerên siyasî vê mîrata hizirî ya han weke bingehê tekoşîna xwe digirin. Girîngiya vê ramanê di wê rastiyê de ye ku ew pirsa Kurd ne di forma pevçûna etnîkî de, belkû di çarçoveya mafên neteweyan û demokrasiya pirneteweyî de dişopîne.

Ji vê dîtingehê ve, Qazî Mihemed ne tenê dikare wekî rêberê ezmûneke dîrokî, belkû wekî bîrmendekê di afirandina şeweyek ji gotara siyasî de tê mêzekirin ku azadiyê girêdayî bi rûmeta mirovan û beşdariya demokratîk ve pênase dike.

## Nerîna Lîderan



**“Mesûd Barzanî”:**

**“ Rêzdar Mesûd Barzanî êrîşên mûşekî yên balîstîk ên Îranê yên li ser baregehên Pêşmerge (di 24ê Adara 2026an de li devera Soranê) bi tundî şermezar kirin û wekî kiryareke dijminane ya bêhincet bi nav kir”**



**“Donald Trump”:**

**“Trump rêze gefên nû li dijî Îranê da û hişyarî da ku artêşa Amerîkayê “hêj dest bi” wêrankirina bermahiyên binesaziya Îranê nekiriye”**



**“Binyamîn Netanyaho”:**

**“Benjamin Netanyahu got ku Îsraîlê bingehên hikûmeta “terorê” hejandiye ku berî van operasyonan bêşikestî xuya dikir. Wî zêde kir ku piştî Operasyona Şêran û xwepêşandanên berfireh ên li Îranê, rejîm hejiya û zû yan dereng dê hilweşe.”**



**“Marco Rubio” :**

**“ nabe welatekî ku ji aliyê oldarên şîe yên radîkal ve tê birêvebirin,derfet bidin ku çekên navokî bi dest bixe”**

# Êrîşa li ser Bêaliyekî: Îsraîl êrîşî Îranê dike, Îran Herêma Kurdistanê dike armanc



N. Eskender Ceiferî



Her çend di mehên dawî de pevçûnên di navbera Îran û Îsraîlê de gihîştine asteke bêhempa jî, yek ji encamên herî mezin ên vê krîzê berfirehkirina çarçoveya pevçûnê ji hêla Îranê ve bo deverên ku di vê pevçûnê de bi pratîkî ti rolek wan tune ye.

Herêma Başûrê Kurdistanê, ku bi salan hewl daye ku xwe ji pevçûnên herêmî yên li dijî Îranê dûr bixe, niha bûye yek ji armancên sereke yên êrîşên Îran û hêzên hevalbendên wê; rewşek ku ne tenê ji dîtin û ramana mirovî lê di heman demê de ji hizra mafên navnetewî jî hêjayî nirxandin û rexneyê ye.

Li gorî raporteke ku ji hêla Tîmên Aştiyê yên Civakî ve li Kanadayê hatiye weşandin, di mehekê de, herî kêm 474 êrîşên Îran û komên girêdayî wê li Herêma Kurdistanê hatine tomarkirin.

Ev statîstîk bi zelalî nîşan didin ku em bi meyleke sîstmatîk û armancgirtî re rû bi rû ne. Wate ew êrîş, ne tenê êrîşên bêserûber an bertek in. Ji van, 179 êrîş rasterast ji hêla Îranê ve û 295 ji hêla komên çekdar ên hevalbend ên wan li Iraqê ve hatine kirin, komên ku bi bandor wekî wekîlên Tehranê li herêmê tevdigerin.

Balkêşiya erdnîgarî ya van êrîşan jî pir girîng e. Zêdetirî 78 ji sedî ji êrîşan li parêzgeha Hewlêrê qewimîne, herêmek ku ne qada şer e û ne jî gefek rasterast ji bo Îranê ye.

Ev yek îdiaya fermî ya “armanckirina gefên ewlehiyê” dixe ber pirsyarê û nîşan dide ku çarçoveya armancên Îranê ji çarçoveyên parastinê pir zêdetir hatiye destnîşankirin.

Ji dîtingeha mirovahiyê ve, encamên van êrîşan pir xemgîn in. Li gorî heman raportê, hejmara giştî ya qurbaniyan li Kurdistanê zêdetirî 100 kesan e, ku ji vê hejmarê, herî kêm 14 kes hatine şehîdkirin û zêdetirî 90 kesan birîndar bûne.

Ji bilî van qurbaniyan, pêşesaziya sivîl jî bi giranî zirar dîtiye, ji xanîyên niştecîbûna sivîlan bigire heya navendên perwerdehiyê, ku li hin deveran neçar mane ku werin girtin. Ev rastî, nîşan dide ku sivîl, armancên sereke yên van êrîşan in.

Lê dibe ku xala herî girîng nakokiya eşkere di navbera livînên Îranê û rastiyên li ser erdê de be. Di salên dawî de, Herêma Kurdistana Başûr ne tenê gef li ser Îranê nebûye, lê di rastiyê de siyasetek hişyar û bêalî şopandiye.

**Partiyên Rojhilatê Kurdistanê jî, tevî nakokiyên wan ên dîrokî bi Tehranê re, ji bo ku hincetê nedin Îranê, bi piranî ji çalakiyên çekdarî dûr ketine. Lêbelê, ev sînordarkirin ne tenê nebûye sedema kêmkirina aloziyê, lê di heman demê de bi zêdebûna êrîşan re jî rû bi rû maye.**

Ev rewş hin pirsyarên bingehîn derdixe holê: Armanca rastîn a van êrîşan çi ye? Ger îdiaya “parastina pêşwext” rast be, çima deverên sivîl û navçeyên aram dibin armanca wan êrîşên Îranê? Û heke armanc astengkirin be, gelo zext li ser herêmekê ku bi rastî bêalî bûye, dikare ewlehiyek mayînde biafirîne an jî tenê çerxa nû ya pevçûn û nearamiyan li Rojhilata Navîn gur dike?

Gelek çavdêr, van êrîşan wekî beşek ji şerê berfirehtir ê milesên alîgirên Îranê li navçeyê şîrove dikin, stratêjiyek ku Tehran hewl dide bandora xwe bi rêya wan koman ve zêde bike.

Pirsgirêk ev e ku ev siyaset, bi taybet li Iraqê, bûye sedema têkdana serweriya netewî û berfirehbûna dabeşbûnên navxweyî.

Herêma Kurdistanê, ku heya niha yek ji herêmên herî aram ên Iraqê bû, niha di metirsiya kişandina nav wan nakokiyan de ye ku di afirandina wan de tu rolek nebûye.
Li gor mafên navnetewî, dijwar e ku mirov rewatiyê bide êrîşên berdewam ên li ser beşek ji axa dewletek serbixwe.

Ev kiryar ne tenê serweriya Iraqê binpê dikin, lê di heman demê de metirsiya normalbûna tevgerên weha li herêmê zêde dikin; rewş û riftareke serbazî ya nehêja ku dikare bandorên berfirehtir li ser ewlehiya Rojhilata Navîn bike.

Di dawiyê de, tiştê ku îro li Herêma Kurdistanê diqewime ne tenê krîzek herêmî ye; ew nîşan dide ku Îran dixwaze şer bibe deverên ku berê hewl didan jê dûr bisekinin.

Berdewamiya vê riftarê, ne tenê ewlehiya Herêma Başûrê Kurdistanê, lê di heman demê de gefê li aramiya tevahiya Iraqê û derveyî wê jî dike.

Ger dawî li êrîşên Îranê neyê, dibe ku Kurdistan bibe mînaka herêmekê ku bi nexwestî ketiye nav şerekî ku qet hilnebijartiye.

**Di hejmara vê carê de li ser berdewamiya şerê Amerîka û Îsraîlê digel rejîma Îranê û dawî bertek û gotinên Amerîkayê û taktîkên wê di şer de, me digel rojnamevan Maksîm Alîsa hevpeyvîn encamp daye.**



Hevpeyvîn: Maksîm Alîsa - Rojnamevan

**Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzade – Agirî**

**1- Kûşka Spî dibêje ku danûstandin berdewam in û baş pêşwe diçin; gelo di rastiyê de jî ew danûstandin hene yan na, an jî ev tenê peyamek taybetî li pişte?**
Ez bawer nakim, ku êdî danûstandin hene! Amerîka wisa dibêje, da ku tevdîrên xwe ji bo destêwerdaneke bejayî bi dawî bîne. Yanî Amerîka û hevbendên wê tevdîrên dawî yên rûxandina rêjîmê amade dikin.

**2- Li gorî gotinên Sêntkamê, Amerîka bi salane kar dike li ser hêrşa erdî bo ser Îranê; gelo rejîma Îranê şiyana berxwedanê heye li dijî hêzeke pêşkeftî ku ji erdî, asmanî û deryayê ve êrşî ser bikin?**
Amerîka hêzên esmanî û deryayî yên Îranê bi dawî anîne! Da ku şerê bejayî bi ser bikeve, divê hin hêzên marênz derbas bibin, hingê dê gelek leşker û efserên artêşê cihê bibin (Wek çawa li Sûriyê).

Lê heger hêzên Amerîkayê bejayî derbas nebin, wê demê ne leşkerên faris, ne jî kurd, Ehwazî û Belûçî dikarin tevgerê bikin. Bi derbasbûna bejayî, dê artêşa Îranê ji hev bikeve û dibe û hêzên pasdaran jî ji hev bikeve.

**3- Di encama hêrşên wan çend rojên derbasbûyî bo ser jêrxanên wîzê li Kerec û Teheranê, elektrîka beşeke zêde ji wan her du bajarên qet bû; ew êrîş çi digihînin û çi peyamek hene?**
Amerîka nameyekê dide Îranê, ku ew dikare wê ji hev bixe û wê hezar salî bi paş ve vegerîne. Ez bawer im, ku Amerîka dê greva Xark bi temamî bixe bin kontrola xwe, da bikare Tengeavgeha Hormozê û jêderên neftê biparêze.

**4- Çima rejîma Îranê her tim di rewşên hestiyar de zêdetir givaşê dixe ser xelkê sîvîl yê Îranê?** Bo mînak, bi tometa hevkariyê bi Îsraîlê re an endamtiya Mosadê, gel tê binçavkirin û darvekirin û gelo ev wek derfet tê bikaranîn bo bêdengkirina dengê nerazîtiyê?

Rêjîma Sûriyê jî wisa bû! Ji ber tewanbariyeke rasteqîn tune ye, lewra divê ew rêjîm tewanbariyekê bafirîne! Ew jî ajaniya Israîlê ye! Heger vê carê gelên Îranê rabin ser xwe dê dawiya rêjîmê were. Em dibînin, ku çawa serok, wezîr û hin serkirdeyên rêjîmê beşdarî xwepêşandanên Tehreanê dibin. Ev ne xurtbûne e! Ev tirsa ji raperîneke mezin e!

**5- Armanca her yek ji Amerîka û Îsraîlê ji wî şerî çiye? Gelo armancên wan cudane?**
Bi baweriya min, Amerîka di destpêkê nedixwest rêjîmê birûxîne! Îsraîlê ji despêkê ve ev armanca wê bû. Ji bo Amerîkayê tenê pêwîst bû, ku Îran bombeya nukliyar û mûşekên balistî çê neke û li gel wê peymanekê wajo bike. Lê piştî ku Xamîneyî û serkirdeyên refên yekê û dudiyê yên siyasî û leşkerî hatin kuştin, diyar bû, ku Îran ne wisa bi hez e, weke ku ew dibêje! Îrana ku her demê digot, ew dê Îsraîlê ji nexşeya Cîhanê rake, dereweke mezin derket.

Ji ber wê êdî Amerîka tevlî helwesta Îsraîlê bûye û ew jî dixwaze vê rêjîmê birûxîne.

Armancên Amerîka û Îsraîl di bingeh de hevparin, lê di taktik û girîngahiyan de hin cudahî hene.

**Armanca Amerîka:**
Amerîka dixwaze hêza herêmî ya Îran kêm bike, rê li ber berfirehbûna bandora wê bigire, û ewlehiyê li herêmê biparêze bi taybet li rêyên enerjiyê û bazirganiyê.

Di heman demê de, Amerîka hewl dide ku şer negehe astekî berfireh ku kontrol kirin ji dest derkeve. Ji ber vê yekê, Waşington gelek caran di navbera zexta leşkerî û diplomasî (danûstandin) de balansê ra digere.



**Armanca Îsraîlê:**
Îsraîl şerê wekî mijareke "hebûn û nebûn" dibîne. Armanca sereke ew e ku hemû hêz û şiyana leşkerî yên Îran û hevalbendên wê li herêmê (wek mînak li Lubnan, Sûriye, an Gaza) bêne têkbirin.

Ji ber vê yekê, Îsraîl bi gelemperî stratejiyek tundtir û rasttir heye û kêmtir amade ye ku bi şertan bigere ser masaya danûstandinê.

Cudahî: Erê, cudahî hene: Amerîka li ser kontrolkirina şer û parastina balansê dixebite.

Îsraîl li ser têkbirina temamî ya metirsiyê (bi taybet ji aliyê Îran) rawestaye. Di encamê de, em dikarin bibêjin ku armancên wan stratejîkî hevbeş in, lê rê û astên tundiyê yên wan cudane.

**6- Li gorî gotinên dawî yên xwedî Donald Trump, gelo ew dixwaze şer berdewam bike an danûstanê bike?**
Ez bawer nakim, ku derfeta danûstandinê mabe! Heger hebe jî, ew dê ji bo ku rêjîm xwe teslîm bike! Dema Wezîrê Karê Derve Îraqcî û Serokê Îranê Pizîşkiyan dadikevin meydanên xwepêşandanan, ev diyar dike, ku rêjîm çiqas lawaz e! Bi baweriya min, ku Trump bi hin gotinan dixwaze demê derbas bike, da ku hêzên Marênz xwe ji bo operasiyonên bejayî amade bike.

Di destpêkê de, ew dê greva Xarkê kontrol bike, da Tengavgeha Hormozê û jêderên petrolê bê tamînkirin û bandor li aboriya Cîhanê nebe û paşê dê dest bi şerê bejayî bê kirin.

Li gorî gotin û helwestên dawî yên Donald Trump ew bi giştî xwe wek kesekî nîşan dide ku dixwaze şerên dirêj nebin û Amerîka nebe di nav şerên derveyî de bi awayekî berfireh.

Lê di heman demê de, ew pir caran dibêje ku heke pêwîst be, dê hêza leşkerî bi tundî bikarbîne da ku dijminan bi lez bîne ser rêya xwe.


Wateya siyasî ya vê helwesta Trump ne tenê li aliyê şer e û ne jî bi temamî li aliyê aştiyê. Stratejiya wê zêdetir li ser "zexta nisbî + danûstandina bi şertên xwe ava bûye.

Ji ber vê yekê ew dikare di demekê de şer zêde bike ji bo zextê,û di demeke din de li ser masaya danûstandinê rûne, ger ew şertên xwe baş bibîne.


Encam: Helwesta Trump pragmatîk e: şer wek amûrek ji bo bidestxistina şertên siyasî di danûstandinan de tê bikaranîn, ne wek armancek bi xwe.

**Sîmîm Rûhanîzade: Gelek spas kek Maksîm Alîsa**

# Partiyên Siyasî yên Kurdistanê, Ezmûnek Berbiçav di têkoşîna ji bo Avakirina Demokrasiyê de



N. Mojgan Elîpûr
W. Hesen Mukerem



Di çarçoveya şiroveyên siyasî de, avakirina sîstemên demokratîk di civakên di bin rejîmên dîktatorî de pêvajoyek tevlihev, piralî û demdirêj e ku ne tenê bi guhertinek bilez ya desthilatdariyê re hevaheng e, lê di heman demê de avakirina bingehên kûr ên civakî û çandî jî hewce dike.

Ji vê perspektîfê ve, ezmûna partiyên siyasî yên Kurdistanê weke yek ji xalên herî xurt û bibandor ên têkoşîna ji bo demokrasiyê xuya dike, ku bi salan e, tevî zexta sîstemîk û jîngeha siyasî ya sînorkirî, bi berdewamî tê ceribandin.

Ev ezmûn bi gelemperî ji hêla tevliheviyek têkoşîna siyasî, fonksiyona rêxistinî û pêşkeftina hişmendiya civakî ve hatî afirandin, ku hêdî hêdî lê bi kûrahî çandek demokratîk di civakê de bi afirandina gotara maf, azadî û beşdariya giştî ava kiriye.

Her wiha, ev hewldana berdewam ne tenê ji bo parastina maf û azadiyên bingehîn xizmet kiriye, lê di heman demê de ji hêla stratejîk ve bingehek girîng ji bo avakirina sermayeya civakî û bihêzkirina hişmendiya siyasî peyda kiriye, ku ji bo her pêvajoyek demokratîkbûnê girîng tê hesibandin.

Di vê wateyê de, ezmûna partiyên siyasî êdî bi têkoşînek demkî ve sînordar nîne, lê bûye pêvajoyek perwerdehiyê û “perwerdehiya demokratîk” ku şiyana civakê ji bo bersivdayîna guhertinên siyasî û amadebûna veguhestina têkoşînê bo pergalê ava kiriye.

Di çarçoveya Rojhilatê Kurdistanê de, ku di bin sîstemeke navendî ya nedemokratîk de dijî, pêvajoya hişmendiya siyasî û pêşxistina çandeke demokratîk bi awayeke taybet û cuda pêşketiye.

Di vî warî de, partiyên siyasî yên Kurd weke faktorên sereke yên opozisyonê ne tenê di rêvebirina têkoşîna siyasî de rolek lîstine, lê di heman demê de ji bo avakirina sermayeya civakî û afirandina qadeke giştî ya agahdar û hişyar jî xebitîne.
Ev çalakiyên siyasî û rewşenbîrî bi berdewamî bûne sedema avakirina formeke nû ya hesta hemwelatîbûnê ku li dijî forma dîrokî ya “subjekt” di pergalên otorîter de radiweste.

Bi vî awayî, civaka Rojhilat hêdî hêdî lê bi kûrahî ber bi têgihîştineke nû ya maf û berpirsiyariyên siyasî ve çûye, ku ev jî beşek ji pêvajoya avakirina çandeke demokratîk e.

Di heman demê de, partî bi hewldanên xwe yên berdewam ji bo parastina nasnameya neteweyî, ziman û mîrata çandî karîne têkiliyek organîk di navbera pirsgirêka neteweyî û pirsgirêka demokrasiyê de biafirînin, da ku demokrasî weke çarçoveyek bingehîn ji bo parastina nasname û mafan xuya bike.

Di asta civaka sivîl de, Rojhilatê Kurdistanê mînakek girîng e ji bo pêşxistina celebek berxwedana rêxistinkirî û hişyariya civakî di rewşek sînorkirî de.

Tevî sînorkirin û zextên pergala dewletê, torên sivîl, çalakiyên çandî û NGO karîne qadeke heta asteke giştî biafirînin ku tê de gotûbêja maf û beşdariya siyasî berdewam pêş dikeve. Ev rewş, li gorî gelek deverên din ên Îranê, nîşana astek bilindtir a sermayeya civakî û amadebûna ji bo beşdariya demokratîk e, ku di demek dirêj de dikare weke “tetbîqatek demokrasiyê” were fam kirin.

Ev “tetbîqata demokratîk” ne tenê ji aliyê tevgerên civakî ve girîng e, lê di heman demê de bandorek kûr li ser avakirina kadroyên mirovî û serokatiya siyasî jî dike.

Bi salan, gelek çalakvan, rewşenbîr û endamên civaka sivîl fêr bûne ku cudahîyan birêxistin bikin, diyalog bikin û birêve bibin, ku ev bingehek girîng e ji bo her pergalek demokratîk ku pirrengî û qebûlkirina cudahîyan hewce dike.

Bi vî awayî, Rojhilatê Kurdistanê ne tenê di asta civakî de, lê di heman demê de di asta kadroyên siyasî yên pêşerojê de jî xwe amade kiriye.

Ji aliyê aborî û civakî ve, her çend herêm bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû mabe jî, ezmûna hevkariya civakî û piştgiriya herêmî cureyek ewlehiya civakî afirandiye ku dikare bibe bingehek baş ji bo pêşxistina demokrasiyê.

Ev cure hevkariya civakî û hevgirtinê, ku pir caran di dema qeyran, karesatên xwezayî û yên dine de tê xuyang kirin, nîşanek sermayeya civakî ya bilind e ku bandorek erênî li ser pêvajoya demokratîkbûnê dike.

Ji hêla stratejîk ve, ev tetbîqata berdewam rê li ber Civaka Rojhilat vekiriye ku kapasîteya herêmî ava bike da ku bersivê bide her guhertinên siyasî li asta navendî ya dewletê.

Di qonaxa niha de, heke li Îranê guhertinek siyasî çêbibe, herêm dikare bi lez û bez û bi kêmtirîn astengiyan derbasî formeke pêşketîtir a rêxistina siyasî bibe, ji ber ku bingeha civakî û çandî ya vê veguherînê berê hatiye afirandin.


**Di vê wateyê de, Rojhilatê Kurdistanê ne tenê weke wergirê guhertinê tê dîtin, lê di heman demê de ew dikare weke aktorek bi bandor di rêvebirina van guhertinan de destpêşxeriyê bigire û ji bo herêmên din bibe mînak.**


Her wiha, têkiliyên navneteweyî û mezinbûna medyaya nû roleke xurt di pêşxistina vê pêvajoyê de lîstine. Dengê civaka Rojhilat bi awayeke berfirehtir gihîştiye qada cîhanî, û ev yek alîkarî kiriye ku di nav mirovan de hestek hevpariyê çêbibe û hêviya guhertinê zêde bibe. Di heman demê de, ev têkilî dikarin bibin çavkaniyek piştgirî û alîkariyê ji bo avakirina saziyên demokratîk di dema guhertinê de.

Di encamê de, dikare were gotin ku Rojhilatê Kurdistanê niha di qonaxek dîrokî ya girîng de ye, ku tê de hemû hewldanên ku di salên borî de ji bo afirandina wê hatine kirin... Hişmendî, sermayeya civakî û çanda demokratîk têne dayîn, ew dikarin di demên guhertinê de bi lez û bez û bi bandor bikevin meriyetê.

Rola erênî ya partiyên siyasî yên Kurd, digel pêşkeftina civaka sivîl, rê li ber wê yekê vekiriye ku herêm “demokrasiyê bi kar bîne”, û ev yek hêviyê çê dike ku di pêşerojê de ew dikare bibe yek ji pêşengên avakirina pergalek demokratîk li herêmê.

# Beşdarkirina Zarokan di Operasyonên Ewlekariyê de, Bandora Derûnî, Civakî


N. Sefiye Xalidî



Komara Îslamî ya Îranê zarok û ciwanan di çalakiyên ewlehî û leşkerî de bi kar tîne ji ber ku ew wan wekî nifşekê dibîne ku şekildan û perwerdekirina wan hêsantir e.

Di vî temenî de, ciwanan nasname û perspektîfên xwe bi tevahî ava nekirine, ev yek jî ji bo rejîmê hêsantir dike ku nirx û armancên xwe yên îdeolojîk di hişê wan de biçîne.

Bikaranîna wan her wiha torên çavdêriya civakî diafirîne, ku kontrol ne tenê ji jor ve tê kirin, lê ciwan bi xwe dibin amûrên çavdêrî û rapordanê. Ev hem hebûna hêzên ewlehiyê berfireh dike û hem jî lêçûna protesto û berxwedanê di civakê de zêde dike.

Di demên krîzê an zexta ewlehiyê ya zêde de, ciwan wekî hêzên nerm û bilez tevdigerin, ku bi lez di nav avahiyên ewlehiyê de têne entegrekirin.

Di heman demê de, bikaranîna ciwanan pir caran bi vegotinên sembolîk re tê, wek parastina welêt an beşdarbûna di parastina aramiyê de, da ku hestek rewatiyê bide vê pratîkê.

Digel vê yekê, lêkolîn û raporên navneteweyî nîşan didin ku tevlîkirina zarokan di çalakiyên ewlehiyê de encamên cidî û mayînde yên psîkolojîk, civakî û nasnameyê hene, ku tehdît li ser başiya nifşên ciwan dike.
Di dawiyê de, tevlîheviyek ji armancên îdeolojîk, hewcedariyên operasyonê, stratejiyên kontrola civakî û şert û mercên krîzê, rejîmê ber bi bikaranîna Zarok û ciwanan di rolên ewlehiyê de dibe, lê encamên ji bo pêşketin û tenduristiya wan a derûnî pir zirardar in.



Ji perspektîfa qanûna navneteweyî ve, bikaranîna zarok û ciwanan di çalakiyên ewlehî û leşkerî de binpêkirineke cidî ya mafên mirovan ên naskirî û pîvanên mirovî pêk tîne. Li gorî Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (CRC), ku zarok wekî her kesê di bin 18 salî de pênase dike, dewlet mecbûr in ku zarokan ji beşdarbûna di şerên çekdarî, îstismarkirin û her çalakiyek ku dikare başbûna wan a laşî an derûnî bixe xeterê biparêzin.

Bi heman awayî, qanûna mirovî ya navneteweyî, tevî Protokola Vebijarkî ya CRC-ê ya li ser Tevlêbûna Zarokan di Şerê Çekdarî de, bi eşkereyî leşkerkirin an karanîna zarokên di bin 18 salî de di dijminatî an rolên têkildarî şer de qedexe dike.

Ev protokol van pêkanînan wekî zirardar û îstismarkar pênase dikin, û encamên psîkolojîk, civakî û fîzîkî yên demdirêj ji bo zarokan nas dikin.

Tevlîkirina zarokan di xalên kontrolê, çavdêriyê, an berhevkirina îstixbaratê de, heta bêyî şerê rasterast jî, dikeve nav şîrovekirina berfirehtir a tevlêbûna di operasyonên ewlehiyê de ku zarokan bi xetere û zorê re rû bi rû dihêle.

Qanûna navneteweyî kiryarên weha wekî celebek îstismarê dibîne, û di hin rewşan de, ew dikarin di bin sûcên şer an sûcên li dijî mirovahiyê de werin dabeş kirin, nemaze dema ku bi awayekî sîstematîk wekî beşek ji siyaseta dewletê têne bikar anîn.

Ji bilî qedexeyên yasayî, rêxistinên navneteweyî yên wekî UNICEF û Human Rights Watch bi berdewamî tekez kirine ku beşdarbûna zarokan di rolên ewlehiyê de mafên bingehîn ên perwerde, tenduristî û parastinê têk dibe, û çerxên tundûtûjî û trawmaya civakî didomîne.

Di bin van çarçoveyan de, dewlet xwedî erkên zelal in ku pêşî li van pratîkan bigirin û zarokên bandordar rehabîlîte bikin.

Di encamê de, wergirtina zarokan ji aliyê rejîmê ve û bikaranîna wan dikare wekî stratejiyeke piralî were fêmkirin ku civakîbûna îdeolojîk, guncawbûna operasyonel û mekanîzmayên kontrola civakî ya belavkirî dihewîne.

Lêbelê, dema ku bi perspektîfa psîkolojiya pêşketinê ve were lêkolînkirin, pratîkên weha bi bingehîn bi pêşkeftina nasnameyî, hestyarî û exlaqî ya guncaw a temenî re ne lihevhatî ne.

Zû rûbirûbûna bi avahiyên desthilatdariya zorê û jîngehên potansiyel tehdîdkar re rêyên pêşketina normative têk dide, îhtîmala encamên nelihevhatî, di nav de fikara kronîk, belavbûna nasnameyê û nexweşiyên têkildarî trawmayê yên wekî Nexweşiya Stresa Piştî-Trawmayê zêde dike.

Ji perspektîfeke civakî ve, bikaranîna zarokan di rolên ewlehiyê de dibe sedema têkbirina baweriyê, normalîzekirina çavdêriyê û veguhestina tundûtûjiyê di navbera nifşan de, bi vî awayî hevgirtina civakî û berxwedanê qels dike.

Wekî din, di bin çarçoveyên qanûnî yên navneteweyî de, di nav de Peymana Mafên Zarokan û Protokolên wê yên Vebijarkî, pratîkên weha binpêkirinên eşkere yên prensîbên parastinê, ne-îstismarkirinê û berjewendiyên çêtirîn ên zarok pêk tînin.

Bi hev re, hatina zirara psîkolojîk, bêîstîqrariya civakî û nelihevhatina yasayî destnîşan dike ku karanîna zarokan di strukturên ewlehiyê de ne tenê ji hêla exlaqî ve bêparastin e, lê di heman demê de ji hêla avahîsaziyê ve jî zirardar e hem ji bo pêşkeftina takekesî û hem jî ji bo aramiya demdirêj a civakê.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Nîgeraniya Human Rights Watch, li derheq bikaranîna Zarokan ji aliyê Rêjîmê ve



Rêxistina Çavdêriya Mafên Mirovan di raporta xwe ya nû de nivîsand ku Spaha Pasdaran li Îranê, kampanyayek ji bo birêxistinkirina zarokan, heta ji temenê 12 saliyê ve, bi navê "Parêzvanên Welat" daye destpêkirin.

Li gorî daxuyaniya vê saziyê, ev kiryar wekî binpêkirineke giran a mafên zarokan tê hesibandin û di hin rewşan de dikare weke cinayeta şer bê hesibandin.

Li gorî vê raportê, berpirsekî Spaha Pasdaran li Têhranê de ragihandiye ku di çarçoveya vê planê de, temenê herî kêm ji bo navnivîsînê 12 sal hatiye diyarkirin.

Ev kampanya di demekê de tê meşandin ku Îran di hefteyên dawî de rastî êrîşên berfireh ên Amerîka û Îsraîlê hatiye. Çavdêriya Mafên Mirovan dibêje ku amadebûna zarokan li navendên leşkerî de dikare wan bixe ber metirsiya giran a mirin û birîndarbûnê.

Çavdêriya Mafên Mirovan hiştarî daye ku bikaranîna zarokan di çalakiyên girêdayî hêzên leşkerî de, heta di rolên neşerker de jî, wan rastî tundûtûjiyê dike.

Vê rêxistinê ji rayedarên Îranê xwestiye ku vê kempêynê rawestînin û navnivîsiya kesên bin 18 saliyê di nava organên leşkerî û nîv-leşkerî de qedexe bikin.

## Sêdaredana 2 girtiyên siyasî yên din ji aliyê Komara Îslamî ve



Hevdem digel zêdebûna fikarên li ser pêla sêdaredanan li Îranê, dezgeha bi navê dadweriya Komara Îslamî ya Îranê nûçeya cîbicîkirina hukmê sêdaredana 2 girtiyên siyasî yên din ragihand.

Li gorî mediayên rejîmê, hukmê sêdaredana "Babek Elîpûr" û "Pûya Qubadî" sibêdeha roja 11ê Xakelêweyê, piştî pejirandina ji aliyê Dîwana Bilind a rejîmê ve, hat bicîhanîn.

Di wê raporê de hatiye gotin ku ev her du kes bi tohmeta endamtiya di rêxistina "Mucahîdên Xelq" û beşdarîkirin di "çendîn kiryarên bi dijî rêjîmê" de sizayê sêdaredanê bi ser wan de hatibû sepandin.

Ev di demekê de ye ku dezgeha dadweriya rejîmê rojek berê jî nûçeya sêdarêdana 2 girtiyên din bi navên "Mihemed Teqewî Sengdehî" û "Ekber Danişwerkar" bi heman tohmetê ragihandibû.

Di vê pêywendiyê de, Hizba Dêmokrat (PDKÎ) bi weşandina daxuyaniyekê, tevî şermezarkirina sêdarêdana van girtiyên siyasî, ragihand: "Komara Îslamî di bin sîbera van aloziyan de dengê nerazîbûnan difetisîne û bi bêrehmî dijberên siyasî ji nav dibe."

## Wezareta Pêşmerge: 6 Pêşmerge li encama êrîşa mûşekiya rêjîma Îranê şehîd bûn



Wezareta Pêşmerge ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi belavkirina daxuyaniyekê daye zanîn ku li sibêdeha roja Sêşemî 24ê Adarê, rêjîma Îranê li 2 êrîşên cuda de bi 6 mûşekên balistîkî, êrîş kire ser bargeheke firqya 7 a piyade ya devera 1 û hêzeke firqeya 5 a piyade ya Hêza Pêşmerge li sînorê Soran.

Pêka vê daxuyaniyê 6 Pêşmerge yên bi navên: "Rêber Ebdula, Zikrî Bêxşaşî, Ramîn Adil, Şehab Bêxşaşî, Keywan Muzefer û Piştîwan Mela Mûsa" li van 2 êrîşan de şehîd bûne û 30 Pêşmergeyên din jî birîndar bûne.

Wezareta Pêşmerge tevî şermezarkirina tund a vê êrîşê û hemû êrîşên bo ser Herêma Kurdistanê tekez kiriye ku her bersivdanek bi wan êrîş û destdirêjiyên bo ser ax û gelê xwe bo xwe parastî dibîbe.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (515)

